

Dawiya zorê rûreşî ye

Enehîte Mûrad

Dema navê komara îslamî ya Îranê li guhên mirovan dikeve , pêre-pêre jî dîrok û dîmenên rijîma Tehranê ya nemirovane di pêş çavan re diçin û tîn, ku ji roja roj ve daxwaz û armancên wan bêbextane, ku gelê Kurd tarûmar û tune bikin .

Wisani jî - mîna pîrkênmilikdas-ew bi rengên curecure lêdan û qirkirinan li ser gelê Kurd dimeşînin ?. Piştî şikestina rijîma şahê xwînmij û bi serketina sîstema îslamî bi serkêşîya Xumênî ; Tehranê karîbû bi bêbextî û derewan gelên Îranê nemaze Gelê Kurd, di hildana dirûşmên Islamî de bixopandana. Vêca jî, hemwelatîyên Îranê bi hemû netewên xwe ve , hêviyên xwe bilind dikirin û li benda heyameke aştî , azadî û wekihevîyê diman ?.

Lê mixabin rijîma Xumênî, piştî li ser lingên xwe sekinî û komara Islamî ragihand ; Bi qirêjkirin, setem û zordarî dajot, û rojê bi dehan Kurdên me bêsûc û guneh dihatine girtin û kuştin !. Herweha ta roja îro jî, ew reng sîstemrijîma li ser sîngê hemwelatîyên Îranê û nemaze Gelê Kurd berdewam e. Îro jî, çi bi dizî û çi jî aşkere ew bê şerm û fedî, li pêş raya giştî ya cîhanê zor û qirkirina xwe li serê gelên Îranê nemaze Netewa Kurd herberdewam e!. Dadmendiya Qurana pîroz binpê dike !?. Ma gelo, qêrîn û hawara ciwanên me yên Kurd ji keç û xortan, li ber darê îşkencê têne ji bîra kirin?!

Bêgûman, tol û heyfa wan bêgunehan, wê were hildan ?'.

Xuyaye Ehmedî Necad sûd ji çarenûsa cîranên xwe - nemaze ji Sedam negirtiye!. Wisani jî, li serê xwe siwar e, ku negengaze rastiya dîroka Kurdan bipejrîne . Lewre jî roj ji rojê, ew çavsorî û bêbextiya xwe bêtir gur û bi hêztir dike ,û heyama tirsê di nav Kurdan de bilind û zêde dike. Nemaze piştî hîlbijartinê û tirsê wî ji raya hundirê Iranê ;Wî bûyerên bi êş û jan gurtir dikirin , bi sedan xelkên Îranê - bi taybetî ciwanên me Kurdan - davêtin binê zîdanan !.

Bêguman, ciwanên me bi pêdarî û bawerî serî neditewandin û bi serbilindî bersiva xwe didan û digotin : Em Kurd in, xwedî dîrok û xak in, em neviyên Qadî Mihemed, Qasimlo û D.r şerefkendî ne, tu hêz nikare me ji riya wan pakirewanan bizîvirîne!?. Loman jî , li vê dawiyê, di -9- ê Gulana -2010- an de, li girtîgeha Evînê çar ciwanên Kurd yên bi navên Şêrîn , Ferzad , Ferhad , Elî û di gel yekî ne Kurd bi navê Mehdî, bêsûc û guneh hatine darvekirin û bi şahnazî ew diketine nava rêzên pakrewan û zindiyên Gelê Kurd . Ma gelo! ev bêbextiya di kîjan ol û dînî de tê pejirandin, û ta kengê ev rijîma Îranê ya olperest, wê zordariya xwe di bin perda ola Îslamî de, li serê gelê Kurd berdewam bike. Ma raya giştî ya cîhanê **D .R . (5)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de